# Vegerîna bi dilxwaz

Kurdisch-Kurmancî
Informationen für Asylbewerberinnen und Asylbewerber
Agahî ji bo penaberan

## Eger daxwaznameya we ji bo mafê penaberiyê hatiye redkirin, we waxte çı biqêwime??

Hûn dê bên agadarkirin ku daxwaznameya penaberiyê we hatiye red kirin û muhletek didin we ku heta vê muhletê hûn divê ji welat derkevin. Dawîya muhletê 30 rojan be. Heke daxwaznameya penaberiya we bi awayekî normal nayê qebûlkirin ji ber 'ne bes bûna hewce', dawîya muhletê yek hefteye. Heke hûn bi dilxwazî ji welat dernekevin, hûn bi zorê tên rakirin û vegerandin ji bo welatê xwe (dersînorkirinê). Hûn divê li ser mesrefên xwe pareya dersînorkirinê xwe bidin û destûr nayê dayîn da ku hûn derbasî Almaniyayê yan welatekî din ya Ewropa bin ji bo çend salan (qedexekirina çûne hundir). Hûn nikarin bê belgeyên koçberiyê li Almaniya bimînin: Hûn belkî bên binçavkirin ji aliyê polîsan li her demekî de û bên vegerandin ji welatê xwe.

## Bi dilxwaziya xwe hilbijêre ku vegerî û alîkariya karbidestên Almani we re tê dayîn

Heke hûn pare nine ku ji welat derkevin, hûn dikarin daxwaziya alîkarî bikin bi rêya bernameya vegerandinê REAG/GARP. Navê REAG/GARP ji bo programa zivirandin û koçberiyê ye ji bo penaberan li Almaniya/programa zivirandinê ku ji aliyê hikûmetê tê alîkarîkirin. Alîkariya madî alîkariya we dike ku vegerin welatê xwe û bi lênêrîna temam xwe amade bikin ji bo vegerînê. Derketina we tê organîzekirin û mesrefa rêbê dayîn. Piştgîriya aborî yên din jî hene, wekî forma piştevanî an pêşkîşkirinê. Alîkariya bêtir jî heye ji bo kesên ku bi dilxwaz vedigerin welatên hilbijartî ku îmkana destpêkeka nû ji wan re mumkin dikin, wekî mînak alîkarî kirin li peydakirina kar an xanî li wir. Vebijêrkên curbicur dikare bê behskirin li hevdîtina şexsî yê şêwirmendên de.

## Şîretên bêpare li vir bikar bîne ser vegerîna welatê



Heke hûn bi dilxwazî dixwazn vegerin welatê xwe, hûn dikarin her pirsik heye ji **şêwirmendên vegerandina li vir** pirs bikin. Şêwirmendên vegerandinê alîkariya **amadekirina derketina we** dikin, çawan **daxwazname bişînin ji bo xizmeta REAG/GARP** û ji bo her **alîkariyek ku hebe ji bo kesên ku bi dilxwazî vedegerin welatê xwe.** Eger hûn belgeyên rêwîtiyê derbesdar tune, hûn ji ber vê yekê tên alîkarî kirin ji bo biderxistina belgeyên pasaport. Wergêrek di civîna şêwirmendiyê de amade dibe da ku garantî bike ku hûn her tişt fêm dikin. Kesek dikare bi we re be li navenda Şîret vegerandina ji bo wergerandin ji bo we.

Hûn dikarin ji şêwirmendên vegerandin jî alîkarî bixwazin di dema ku **daxwaznameya penaberiyê we tê prose kirin.** Ev jî ji bo **biryara dawî ya penaberiyê bê bandor e.**

Vegerîneka bi dilxwaz jî mimkin e eger proseya penaberiyê nehat temam kirin. Di vê dozê de, hûn pêdiviye proseya penaberiya xwe betal bikin, berî ku hûn ji welatê derkevin. Piştî ku daxwazname hate betal kirin, belgeyên seferê we ji aliyê Dezgeha Federal ya Koçberî û Penaberiyê (BAMF) tê şandin ji ofîsa biyaniyan re (ofîsek ku mafê rûniştinê ya demî dane we) û dikare li wir bê rakirinê.

## Hûn dikarin navenda vegerandinê li navnîşana jêr bibînin:


**Elisa Müller**
Amt für Migration und Integration
Schützenstraße 69; 88212 Ravensburg
2. OG, Raum 219
Tel.: 0751/85-9857
E.Mueller@rv.de

**Sebastian Leidinger**
Amt für Migration und Integration
Schützenstraße 69; 88212 Ravensburg
2. OG, Raum 219
Tel.: 0751/85-9886
S.Leidinger@rv.de


Eger Înterneta we heye, hûn dikarin agahiyên zêdetir li ser vegerîna bi dilxwaz bibînin li:
www.ReturningfromGermany.de/en/

Çêkirî li: February 2018

BAMF | RETURN